Peyam
MALPERA NIVÎSKARÊN KURD E

OPERASYON ÊRÎŞ

Cagro şêxmûs

Ji daxuyaniya Serok Komarê Tirk Abdullah Gul û Serfermandarê Giştî Ilker Başbug tê fêmkirin ku biryara opersyona li bakurê Iraqê, Kurdistana başur hatiye dan.

Bi çi meqsedê Serfermandarê Giştî Başbûg ev daxuyanî daye hebikî şolî xuya dike. Piştî vê daxuyaniyê dibe ku dema operasyonê bê guhertin belkî jî bê betalkirin.Lê herdem dive Kurd li hêviyê bin ku operasyon dest pê bike. Dibe ku dema hûn vê nivîsê biwînin operasyonê dest pê kiribe.

Ji hêla êrîş û operasyonên dewleta Tirk ve, ji xwe her demên Kurdîstanê zivistan, bihar, havîn û payîz germ derbas bûne û vê havînê jî xuyaye wê germ derbas bibe.

Di ware helwesta li dijî operasyonê de ez bi xwe bawar nakim ku Gerîlayên Kurdîstanê hewcwyî şîretan bin. Di nava van sîh salên dawî de, ji pore sere xwe pirtir operasyon dîtine û bi haweyekî serkeftî derbas kirine.Hêviyên min ji hêla Gerîlan ve zêdene û bi qeneeta min ev hêvî ne hisîne.

Lê di derbarê Gelê Kurd bi giştî û di derbarê Kurdîstana Başûr de, mixabin ez nikarim heman hêviyan biparêzim hin gûmanên min hene.

Di derheqê operasyonê de Rêvebiriya Kurdîstana Başûr dibe ku di bin zext û zorek mezin de be, zext û zor her çiqas mezin dibin bila mezin bin, Rêvebiriya Kurdîstana Başûr gerek pişgiriya vê operasyonê neke, qet nebe bê deng bimîne.

Di derbarê lênerîn û îdeolojiya PKK' ê de, dibe ku hin rexne û nerazîbûna Rêvebiriya Kurdîstana Başûr hebin û em zanin ku henin jî, dive bê zanîn ku ev yek biratiya gelê Kurd ji hole ranake. Divê ku birêz Berzanî û Telebanî ji şerê birakujiyê vê yekê ji her kesî baştir fêm kiribin, têgihiştîbin.

Dema operasyonek berfireh li dijî Qandîlê dest pê bike, rêvebiriya Başûrê Kurdîstanê qet nebe di ware polîtîkayê de dive li hemberî wê rawete.

Gelê Kurd yê li Başûrê Kurdîstanê, her çi dibe bila bibe weke operasyona beriya neha, carek din nehêlin Eskerên Tirk yên li Başûrê Kurdîstanê bi cîh bûne tevbilivin û alîkariyê bidin operasyonê. Helwestek wisa wê bibe pişgiriyek baş û nîşanek di cîh de jibo Rêvebiriya Başûrê Kurdîstanî jî. Di ware polîtîkayê de wê destê rêvebiriyê xurt bike. Heya vê gave rewşa gelê Kurd yê li Bakurê Kurdîstanê nehatiye fêmkirin! Di şerên navbêna eşîran de, kesekî bi sere xwe, mirina xwe dide ber çavên xwe û li hemberî eşîrekê rawestiya ye û radiweste. Carekdin eynî mirovin, eynî kesin û li hemberî dewleta Tirk ser berjêrin.Ez bawernakin ku di malbatên gekê Kurd de yek malbat mabe ku dewleta Tirk bi hindikayî kesek ji wan ne kuştibe. Ji hin malbatan bi dehan kes kuştine û hin malbat ji kokve qir kirine. Ecêba mezin eve ku li qarşî çavên dê û bavan zarokên wan dikujin, li ber xort û zarokan dê û bavê wan dikujin, mala wan dişewitînin, wan talan dikin. Li hemberî rewşek wisa merov çawa kari tahmûl bike, bêdeng bimîne nayê fêmkirin.

Di vî warî de divê gazin ji kê bibe ez nizanim.Lê vê yekê ez zanim ku divê him Gel û him jî rêvebiriya gel xwe di ber çavan re derbas bikin. Ev rewşek gelekî xerabe û divê ev rewş wisa berdewam neke, bi taybetî vê havîna ku em dibêjin wê germ derbas bibe. Qet nabe ku esker û pûlisên tirk li ber çavên gelê Kurd zarokên wan bikujun û kerwanên eskerên Tirk di nava bajar navçe û gundên Kurdîsranêre derbas bibin û biçin ser Gerîla. Çi bi xweşî û çi bi zorê, divê ev rê li ber dewleta Tirk û esker û pûlisên wê bê girtin.Divê Gel rabe ser piyan. Ji xwe em di malên xwede, li nava çol û beyarên xwe jî tên kuştin. Hin caran li danheva qizwanan, hin caran li berevkirina maziyan....Dewleta Tirk, Gelê Kurd kiriye berxê ber kêr ê.

Ne em didin nava avê, lehî bi ser me ve tê. Divê em vê gotina Bapîran di bîra xwe ve bînin; 'Ku merov da avê, çi li çongê û çi li navê.' Ji xwe tiştek bi me ve nehiştine û tiştekî ku Gelê Kurd winda bike nîne. Xwedê qewet û rûmetê bide. Bi hêviyên serkeftinê. 08-07-2010.